

## Hin notên xwendina romanekê :

### *Jar lê Sermest û Lokman Ayebe*

#### -I-

Sermestê ku lehengê romanê yê sereke ye, ji ber ku hevalê xwe yê ku pê re ketiye peywendiyêke cinsî kuştiye, xwe sûcdar hîs dike. Hevalê wî, Jar, homoseksuel e û Sermest jî ji ber ku pê re ketiye vê têkiliyê, ji ber xwe fedî kiriye, bi xwe re ketiye navkokiyê û jar xistiye nava xwarina hevalê xwe. Kesek nizane ku Jar ji aliyê Sermest ve hatiye kuştin. Lê belê Sermestê ku hezkiriyê xwe kuştiye, nikare bi barê kuştina hevalê xwe ve bijî û diçe xwe dukuje.

Di vê romana ku Lokman Ayebe di sêzdeh rojan de nivîsandiye de, gelek hêlên pênuşeke ciwan lê li gora ciwaniya xwe jî xurt xwe didin der. Ji ber ku berhema vê pênuşê ya yekem e, divê mirov bizane ku asayî ye ku hin kêmaniyên zimanê wêjeyî tê de hebin ; lê belê nivîskêr bi birêvebirina bûyera xwe ve, bi hûnandina berhema xwe ve, bi xwendevanên xwe dide hîskirin ku ev pênuş dê romanên xurt binivîsîne.

*Jar lê Sermest*, bi kabûseke Sermest ya tevlihev dest pê dike ku dûrî bûyerên romanên kurdî yên ku em fêrî wan bûne ye. Motîfên surrealist di şayesa vê kabûsê de hevdu temam dikin û bandora xwe li dewama romanê bi giştî dikin. Di temamê bûyerên romanê de ku di pênc rojan de derbas dibin, em ê Sermest û êşên wî bi heman şewazê nas bikin. Nivîskar bi vî awayî xwendevanê xwe amadeyî atmosfera romanê ya tarî û kafkaesk dike. Mikurhatin û veşartina tercîh û tendansên cinsî di nava romanê de li bajarekî postmodern ku dişibe bajarên kurdan navkokiyên tûnd di nava lehengan de peyda dike. Hilbijartina cihên bûyeran bêtir weke deverên xalî û tarî, bi şev, odayên piçûk, barana şevê û mija qalind e. Bi tenêti xwe di nava hemû rûpelên romanê re dide der. Qey ji ber wê ye ku di nava şayesên doraliya derve re, di 40 rûpelan de, em pênc caran dibînin ku hezkirî bi destê hevdu digirin. Ev hêla romanê ji bo nivîskêr weke hûrgiliyêke balkêş berbiçav dibe ku tim dubare bûye.

Yek ji giringiyên vê romanê ew e ku ev roman fêrbûyinên romanên kurdî yên berê dişikîne û xwe ji aliyê bûyeran ve jî ji wan bi dûr ve dixîne. Ew herweha bi tercîha xwe ya mijar û lehengên xwe ve jî hişmendiya civatê ya kevnare û hin têt(ne)gihîştinên wê dihejîne. Kesayetiya Sermest du navkokiyên dema me temsîl dike ku herdu jî bi hevdu re têtildar in. Ya yekem, cihê homoseksuelan di nava civata me de ku bi xwe trajediyek e; ya duyem jî navkokiyên kesên xwedî tercîhên cuda ya di nava wan bi xwe de ku ew jî ji perwerdehiya civakê têt.

Sermestê ku bi têtîliya xwe ya bi hevalê xwe re li tendansên xwe yên cinsî û bîseksueliya xwe hay dibe, naxwaze vê yekê bipejirîne. Pejirandina vê rastiyê, ji bo wî ne hêsan e. Ji ber ku ew weha fêr bûye. Civaka ku ew bi axlaq û hişmendiya wê ve mezin bûye, terbiyeyeke mêtantiyê daye giyanê wî. Nivîskar bi xwe jî di vegotina vê têtîliyê de şewazeke ecêb bi kar tîne ku em marjînaliya vê sahneyê li gora civata wî baştir dibînin.

*“Nizanîbûn çawa tavilê du kesên mêt tazî ketibûn pêxîla hev”.* (r.100)

Ev nakokiya ku ji perwerdehiya civakê têt, wî di romanê de ber bi kuştina hevalê wî ve û bi dû re jî ber bi xwekuştinekê ve diajo ku xwendevan di nava monologên Sermest yên ku baş hatine avakirin re dişopîne.

Monologên lehêng û vegotina vebêjêr bi awayekî weha li hev hatine siwarkirin ku mirov sedema wê jî baş fahm dike. Di gelek romanên kurdî de hin awayên vegotinê yên weha hatine bikaranîn. Lê di vê romanê de mirov bi hêsanî têt digihîje ku ne ji monologên Sermest be, biryara wî ya xwekuştinê û sedemên wê yên berî destpêka romanê dê neyên fahmkirin. Nivîskar herweha ji derfetên vegotina romanesk jî bi vî awayî destkewtî bûye û ew di

berhema xwe de baş bi cih kirine ku weke hin romanên kurdî yê din pîneyan neynin bîra mirov.

Di nava vê teknîka vegotinê de, hin cih hene ku belkî diviya nivîskêr hebekî din jî bêhna xwe bi demê re fireh bikiraya. Roman berhema bêhnfirehiyê û sebrê ye. Lê di vê romanê de hin caran mirov pê derxîe ku nivîskêr ev taybetmendiya berhemdariyê jî bîr kiriye. Di navbera r.53 û r.60 de sê caran bûyer û mekan ji hevdu qut dibin ku sedema wê jî kurtbûna dema nivîsandina wê ye. Ev qutbûyin ji ber ku xeta herikîna romanê diguherînin, weke kêmaniyên teknîkî dikarin bêne nirxandin. Belkî mirov dikare vê kêmaniyê bi tecrubeyê ve jî girê bide ku di berhemên yekem de gellekî asayî ye. Sêzdeh roj tucarî têra nivîsandina romanêke têkûz nakin. Heman qutbûyina bûyerê di r.82 de jî heye. Lê dîsa jî ji ber ku romana wî ya yekem e, mirov divê di vê hêla berhemdariyê de li sedema van kêmaniyan bigere.

## II-

Sermest diêşe. Sermest dizane ku ew nikare li tercîhên xwe yê cinsî mikur were. Ji ber ku nikare ne bi tenê li xwe, ew nikare li kesekî din jî mikur were. Li gora ku em fahm dikin, ji wî û hevalê wî yê ku bi wî re dikeve vê pêwendiya homoseksuelî pê ve kesek bi wan nizane. Di vî warî de, ji ber ku Sermest dixwaze tercîhên xwe yê ku ne li gora axlaq, hişmendî û perwerdehiya civatê ne veşêre, biryara kuştina hevalê wî (Jar) weke biryareke xurt xuya dibe. Lê belê, di vê romanê de pirsgirêka tevna mijarê jî di vira de hebekî dikule.

Ji bo çi ? Ger mirov bala xwe baş bide rewşa Sermest ya derûnî, di temamê romanê de, mirov dê bibîne ku hemû psîkolojiya wî ya ku xwe di monologên wî re dide der, li derdora vê navkokiya nava wî ya ku li ser tercîha wî û kuştina hevalê wî hatiye avakirin digere. Navkokiya ku dibe jêderka van herdu kirinan, navkokiya bi axlaqê civakê re ye. Digel ku ev hêla lehêng ji bo vê romanê gelekî girîng e jî, Sermest di vî warî de pirsan ji xwe nake. Ji xwe, ew hevoka ku diyar dike bê çend caran Sermest û Jar bi hev şabûne jî pirsên me yê di vî warî de xurttir dikin :

« *Ji esir de hatibûn mala Jêr. Cara dawî bi hev şa bûbûn.* » (r. 99)

Piştî van hevokan, em ê bibînin ku Sermest dê kuştina hevalê xwe amade bike. Lê belê, ev hevoka ku dibêje « cara dawî bi hev şabûbûn », di romanê de ji bo xwedevên dibe deriyekî nuh. Ev tê wê wateyê ku « ew gelek caran bi hev şa bûne », û êdî vebêjer dê behsa vê têkiliya wan bike û bibêje bê çima digel ku gellek caran bi hev şa bûne jî, Sermest nuha dixwaze hevalê xwe ji holê rake. Ma ew peywendî ne bi dilê Sermest e jî ? Lê belê romannivîs di vira de bersiva pirsan û herweha bersiva hêviyên xwendevên nade û di sê rûpelan de di ser re behsa têkiliya van herdu xortan dike û derbas dibe.

Digel kurtbûna xwe jî, divê mirov bibêje ku bûyera ku aşê vê romanê digerîne jî ev bûyer û nemaze jî bihevşabûna wan e. Ji ber ku hemû roman li ser wê hatiye avakirin. Lê belê, dîsa jî divê em bi bîr bixînin ku em di vê romanê de bihevşabûna wan nabînin ku ev xal gellekî girîng e. Hemû xwerûbûna vê romanê ku hêviyên xurt di romannivîsiya kurdî de dixê dilê mirov di vî beşî de mixabin dixetîme. Ji ber ku romannivîs li hûrgiliyên vê têkiliyê nakole û hema bi du-sê hevokan derbas dike. Bê guman, roman orjînalbûna xwe êdî wenda dike. Ma gelo ji bo çi em dibêjin ku pêwîst e ku behsa wê bihevşabûnê bibe ? Em ê li jêrê behs bikin, lê ji nuha ve em bibejin ku heke mirov di romanê de behsa vê bihevşabûnê nekir, hingê divê mirov qet behsa tu bihevşabûnên din jî neke. Em ê di vê têkiliya herdu lehengan de çend pirsên xurt ji xwe bikin û hewl bidin ku pêvajoya afirandina wan ya li cem nivîskêr fahm bikin.

Peyvên ku ji bo şayesandina vê têkiliyê û binavkirina wê hatine hilbijartin jî dê pirseke din ji bo nirxandina vê romanê bidin peydakirin.

« Rojên ewil ku wan hev nuh nas kiribûn wî nizanîbû di Jêr de hestên homoseksuweliyê hene. Û heta wê roja ew jî bi wî re *ket xefletê* nizanîbû ev hest di wî jî de hene. Ew roja wan a cara yekem *ketibûn xefletê* weha çêbûbû. »

Ev hevok dê me vegeŕînin nîqaşa me ya li ser « cara dawîn ». Bê şik, heke « cara dawîn » hebe, divê careke pêşîn jî hebe. Lê heke mirov behsa cara pêşîn jî kir, hingê divê mirov guherîna peywendiya wan û asta wê jî diyar bike. Roman, di eslê xwe de, bi van hêlên xwe ve dibe cîhê lêkolîna li ser tevger û helwêstên mirov. Pirsên girîng di vê romanê de guherîna lehengan ya di vê rewşa nuh de ye. Mirov dibêje qey helwêsteke nexuyayî li dijî homoseksueliya lehêng tev geriyaye û rê li ber hin hêlên vê romanê girtiye. Ya girîng jî binavkirina têkiliya lehengan e.

Heke em li mînaka jorê binîherin, em ê bibînin ku vebêjer vê têkiliyê weke « xeflet »ê bi nav dike. Bi gotineke din, ji ber ku baş ne diyar e bê ew peyv û ew helwêst ya kê ye, ev têkîlî li gora nivîskêr bi xwe jî « weke xeletiyekê » xuya dibe. Lê ji ber hîlbijartina mijarê, mirov dikare bi hêsanî pê derxe ku helwêsta nivîskêr ne ev e. Ji ber wê, em ê ji vê xeletiyê re bibêjin « xeletiya hîlbijartina peyvê ».

Ji vira û bi şûn de, êdî vebêjer dê behsa têkiliya wan a yekem bike :

*« Di ser naskirina wan re nêzîkî salekê qediyabû. Jar ji bo xebata waneyê hatibû mala Sermêst. Hinekî xebitîbûn pê re ji xebatê aciz bûbûn û bi hev re çûbûn ji sûkê mey kirrîbûn û vegeŕiyabûn malê. Jixwe çî bûbû piştî vexwarina wê meyê û di dema serxweşiya wan de çêbûbû. Nizanîbûn çawa di tavilê de du kesê mêr tazî ketibûn pêxîla hev. »*

Gava ku mirov bala xwe baş bide sazkirina vê bûyera ku dê romanê bide nivîsandin, mirov dê bikeve wê baweriyê ku helwêsta ku nivîskar li hemberî bûyera xwe werdigire, helwêsta civatê ye, lewre « nizanîbûn çawa du kesê mêr tazî ketibûn pêxîla hev ». Mirov dikeve wê baweriyê ku ew herdu leheng bi şaşî ketine hembêza hevdu. Di civateke weha rojhilatî de ku homoseksuelî dibe sedema kuştin û xwekuştinê de, zehmet e ku mirov bawer bike ku mirov dikare bi şaşî têkeve hembêza hevdu. Ji xwe berî ku ew peywendî di nav wan de çêbibe, « ji sûkê mey kirrîbûn ». Lê belê hevoka piştî kirrîna vê meyê tê, nirxandina me mafdar dike.

*« Jixwe çî bûbû piştî vexwarina wê meyê û di dema serxweşiya wan de çêbûbû ».*

Têkiliya homoseksuelî û « mey » û « dema serxweşiyê », bi me didin fahmkirin ku lehengan beyî xwe dest bi têkiliyê kiriye. Lê heke weha be « çima gellek carên din bi hev şa dibin » ? Ji ber ku « cara dawîn bi hev şa bûbûn » di vê romanê de heye. Heke ewqasî bi Sermêst giran bû, çima piştî bihevşabûnê wî dikuje ? Dikarîbû ew kuştin berî bihevşabûnê jî pêk bihataya.

Mirov divê li xwe mikur were ku têkiliya homoseksuelan bûyereke balkêş e, nemaze jî ji bo civaka me ya rojhilatî. Erê, nivîskêr mijareke xurt peyda kiriye. Ji ber wê jî diviya ku nivîskêr hebekî din li hûrgiliyên vê têkiliyê bikolaya. Nebûna vê lêkolînê xwe di romanê de baş dide xuyakirin. Vebêjer, ji ber vê kêmaniyê, mixabin dûrî bûyera sereke maye. Qey ji ber wê ye ku di romanê de bi tenê weha bi çend hevokan hatiye vegotin û hew. Lê belê, heke mirov di romanekê de sê caran û li sê deverên cuda û bi kesên cuda re li dîmenên bihevşabûnê rast were, mirov bivê nevwê van hersê bihevşabûnan dide ber hev.

Bihevşabûna Sermest û keçîka kolanê ya şoqesor (r.108-109), ku di eslê xwe de ev bihevşabûn xeyalî ye ; bi dû re jî bihevşabûna bi Ronayê re (r.111-112) û têkiliya Jar û Sermêst. Herdu têkiliyên din ku têra xwe hûrgiliyan dihewînin, li hember têkiliya Jar û Sermêst ya ku di romanê de ji herduyên din girîngtir e, lê ji herduyên din kêmtir bala vebêjêr

dikişîne (bi tenê bi hevokekê dibêje ku bi hev şa bûne û hew !), weke ku jê giringtir bin hatine ravekirin. Heke mirov ji xwe bipirse ka gelo çima digel ku bûyera sereke qels hatiye hiştin, ewqas hûrgilî di bûyerên din de hene, mirov dikare bersiveke balkêş bi dest bixe.

Ya rastîn, bersiv hêsan e. Cudahî di rengê têkiliyan de ye. Ji ber ku di peywendiyên din de Sermest û jin hene û ji ber ku erotîzma ku di têkiliya jin û mêran de heye, ji ya ku di têkiliya du zilaman de heye bêtir bala civatê dikişîne, ev bûyer bi dorfirehî hatine vegotin. Ev nirxandin dê me bibe baweriya ku di vê romanê de otosansureke xwezayî heye. Otosansura ku romannivîsê kurd yê ciwan li xwe kiriye, herweha di vî warî de weke neheqîya nivîskêr ya li hember romana xwe û lehengên xwe jî xuya dibe.

### III

Di vê romana ku bi helwêsteke kurmancîhez û bi pênuşeke jîr hatiye nivîsandin de, du hêlên din jî hene ku divê mirov hebekî din bala xwe bide wan. Yek ji wan ku ya herî giring e, psîkolojiya lehengên romanê ye ku me di beşê din de dest pê kiribû ; ya din jî zimanê vegotinê ye ku em ê bihêlin beşekî din.

Hêla vê romanê ya psîkolojîk yek ji sedemên sereke ye ku xatirê vê romanê li cem me zêdetir dike. Herçî leheng in, gava ku ew di nava rewşên xwe yê sosyo-psîkolojîk de hatibin avakirin xurt dibin. Nivîskarê ciwan, Lokman Ayebe, hay ji giringiya vê fonksiyona psîkolojiyê ya di romanê de heye û serê xwe heta ku jê hatiye bi vê hêla lehengê xwe êşandîye ku ev yek ji bo berhema wî ya yekem biserketineke mezin e û pîrozkirinekê heq dike. Di berhemdariya kurdî de, mixabin, ev hêla lehengan ku pêdiviyeye avakirina lehengan a bingeîn e, pir kêr xuya dibe.

Lokman Ayebe bi hewildayîna ravekirina rewşa Sermest a derûnî xwe ji vê kêmaniyê xelas dike û romana xwe ji gelek romanên kurdî yê din ve diqetîne. Monologên Sermest ku di romanê de baş hatine bicîhkirin, û ku piştî xwendinê jî baş di bîra mirov de dimînin, di vî warî de ji bo xwendevanan dibin pîreyên naskirina hişê leheng. Bi xêra bikaranîna van monologan helwêsta Sermest ya li hember bûyerên ku li dora wî digerin û herweha biyanîbûna wî jî di nava atmosfereke postmodern de baş tê fahmkirin. Ne ji wê bûya, ev roman dê nehataya fahmkirin. Hêviya herî xurt ku Lokman Ayebe dide mirov jî di vî warî de ye. Belkî ji bo vê mijarê di romanê de mînakê herî xweş helwêsta Sermest ya li hember rojbûyîna yekî bi navê Serhad e ku li barê ji bo wî stran tê gotin. (r. 44-45). Sermest di dema pîrozbahîya rojbûyîna Serhêd de, biyanîbûna giyanê xwe bi awayekî eşkere dide fahmkirin, lewre, ew dizane ku ew ne li cîhê xwe ye. Heke mirov Sermest di vî warî de bi kesayetiyên romanê yê din re bide ber hev, Sermest weke kesayetiyeye asosyal diyar dibe. Bê guman, ev asosyalî û ev acizî, ji biyanîbûna wî tê. Lê ev biyanîbûyin karîbû hebekî baştir û zêdetir ji hev bihataya veçirandin. Lewre, di romanê de, ev hêla leheng zêde nayê vegotin.

Navkoyeyeke din jî ew e ku diçe şûna hevalê xwe yê ku wî bi xwe kuştîye. Ya rastîn, ew dîmen diviya bibûya cîhê naskirina vê hêla wî. Lê belê, Sermest li wira gelekî normal tev digere û qalîkê xwe yê marjînalîyê diavêje. Xwezî di vî warî de nivîskêr lehengê xwe hebekî xurttir bikiraya. Lewre Sermest ji « biyanîyekî » bêtir, ji aşîqekî bêtir, weke qatilekî profesyonel tev digere ku ev jî pirsan di serê mirov de çêdike.

Erê, Sermest, bi hêlên xwe yê civakî ve kêr be jî, ji aliyê psîkolojîk ve baş hatiye saz kirin. Monologên leheng di vî warî de hîmên xurt ji bo nivîskariya Lokman Ayebe saz dike. Herweha, nivîskar vegotina rewşên psîkolojîk û tevgerên lehengan ya di nava bûyeran re bi monologan bi sînor nake. Tevgerên lehengan yê di nava dîialogan re jî baş hatine ravekirin ku mirov fahm dike ku Lokman Ayebe dizane ku avakirina dîialogan ne bi tenê ew e ku hema mirov peyvên lehengan li dû hev rêz bike. Ev agahiyên teknîkî ku herkes pê dizane, mixabin dikarin rêyê li ber xwendina berhemekê bigirin. Ayebe bi vê hêla xwe ve jî xwe ji gelek romannivîsên kurd ve diqetîne. Di piraniya romanên kurdî de gava ku leheng dipeyivin qet tev

nalivin, qet nafikirin û li dora xwe jî naniherin. Nivîskarên wan romanên peyvên lehengan rave dikin, lê guh nadin hêlên wan ên din. Romana *Jar lê Sermest* di vî warî de wê baweriyê dide mirov ku nivîskêr rê li ber gazindên di vî warî de bi temamî girtiye.

Bi tenê gazindek dikare ji nivîskêr bê kirin : çima bi tenê Sermest ?

Pirsgirêkeke romanên yekkesî ew e ku lehengên din tim qels dimînin. Dilşad di vî warî de mîna keke baş e. Ew bi tenê bi hunermendiya xwe ve ketiye ve romanê, lê weke kesayetiyeke xurt ku li ser hatiye xebitîn xuya nabe. Ji ber ku, Dilşad ji bilî diyalogên bi Sermest re di romanê de weke siyekê ye. Mixabin ji ber ku kameraya nivîskêr tim li dora Sermest digere, em hema hema ji wî pê ve kesekî din nabînin.

Pirsgirêkeke vê romanê ya teknîkî heye ku divê ew jî were destnîşankirin. Monologên Sermest bi wî awayî hatine avakirin ku heta dawiya romanê jî em nikaribin li ser mirina hevalê wî tiştekî ji wî fahm bikin. Ji gotûbêja di navbera Dilşad û Sermest de jî û di hemû beşên din de ku behsa mirina Jêr dibe, em dibêjin qey Jêr xwe kuştiye lê bi dû re em fêr dibin ku mirina wî bi destê Sermest e. Ya balkêş ew e ku Sermest bi xwe jî weke ku weha bawer kiribe xuya dibe. Yanî em çi zanibin, Sermest jî weha dizane. Belkî ev tercîha nivîskêr weke amadekirina bûyerê balkêş be jî, lê gava ku monologên leheng di romanê de çalak bin, mirov ji xwe dipirse ka çima Sermest vê kuştinê ji xwe vedîşêre û « kuştinê » weke « xwekuştinê » rave dike.

Di vî warî de, weke têgeh, kuştin û xwekuştin di romanê de weke ku gelek caran bi zanebûnî tev li hev bûbin xuya dibin. Di nîqaşa bi Dilşad re, Sermest xwekujiyê weke çareseriyekê ji bo xwepaqijkirina ji « vê gemarê » (r. 46) diparêze û diçe bi dû re xwe dukuje, lê belê mijara nîqaşê xwekuştina hevalê wî ye ku di eslê xwe de ne xwekuştinek e. Ew ji aliyê Sermest ve hatiye kuştin.

Ji bo çi em vê yekê weke kêmaniyekê dinirxînin ? Li gora me bi nîqaşên bi vî rengî roman ji mijara xwe ya sereke bi dûr ketiye. Ji ber ku ev roman li ser kuştinekê hatiye avakirin û sedema vê kuştinê jî ji bo romanekê têra xwe heye û pêdivî bi felsefîzekirina tercîha lehengan ve tune ye. Ji ber wê ye ku ew nîqaş baş bi cîh nebûne û weke biyaniyên vê romanê xuya dibin. Heke nîqaşek diviya bihataya kirin, ew jî dê li ser biryara kuştinê û xwekuştina bi dû re bûya ku me bingeha wê di beşê vê nivîsê yê pêşîn de danîbû û giringiya wê ya civakî diyar kiribû.

Roman, weke forma nivîsandinê, kêmaniyan zû diyar dike, lê zêdehiyan jî zû belloq dike. Nîqaşên li ser hunerê û felsefeyê ku bi têkiliyên derdora Sermest re di vê romanê de xwe didin der, li gora me ji bo vê romanê zêde ne. Di berhemên yekem de mirov tim dixwaze hin zanînen xwe jî bixe nava berhemê û bi vî awayî asta xwe ya entellektueliyê diyar bike. Di romana Lokman Ayebe de, ne zêde be jî ev hêl heye. Ji ber wênesaziya Dilşadê ku yek ji lehengên romanê ye navên mina Van Gogh tîna fahmkirin, lê belê navên mina Vîvaldî, Hendel, Chaplin, Stradivaryus, Kafka, Nietzsche û hwd. di vî warî de dikarin weke pîneyên nebaş werin nirxandin. Lê nivîskar xwe bi vê yekê ve bi sînor nake, li ser “çar demsal”a Vîvaldî û felsefeya Nietzsche jî hin nirxandinan bi rêya romana xwe ve dike ku qet hewce bi wan tunebû. Herweha, mirov fahm nake bê ji bo çi “cogito ergo sum”a Descartes bi latîni ketiye vê romanê, ji ber ku Descartes “Discours de la méthode” bi fransî nivîsandiye û ew hevok jî weke “je pense donc je suis” di beşê wê berhemê yê çarem de xuya dibe. Xwezî nivîskar xwe li van navên giran negirtaya. Gava ku mirov bala xwe dide tevna bûyera vê romanê ya têkûz, hingê mirov li ber van zêdehiyan dikeve.

#### -IV-

Zimanê vê romanê yê vegotinê yek ji hêlên wê yên biserketî ne. Gava ku mirov dixwîne, mirov dizane ku Lokman Ayebe jî bi lehengê xwe re diêşe. Eşa Sermest weke ku ya nivîskêr be di nava vegotinê re derdikeve holê. Di seranserê berhemê de, zimanekî hestiyar, şewazeke

nerm, helbestkî û zimanê êşê hatiye bikaranîn. Kurmanciya ku nivîskêr bi kar aniye, kurmanciyeke delal e ku mirov dikare ji bo kesên ku dibêjin « kurdî qels e » weke bersivê jî bi kar bîne. Devokê Dêrikê ku bingeha zimanê vê berhemê pêk aniye, bi vî awayî alîkarî bi tevahiya romanê kiriye. Belkî serkevîna zimanê romanê di vê hêla wê ya zimên de be, lê belê gava ku mirov sînorên helbestê û vegotina pexşanê baş zelal neke, hin pirsgirêkên vegotinê jî peyda dibin. Ji lewra diyar dibe ku kêmaniyên vê romanê yên giring jî dîsa di zimanê wê de ne, lê belê kesên ku tecrubeya berhema yekem dîtibin, dizanin ku mirov tucarî nikare di vê hêlê de gazindan ji nivîskarekî ji bo berhema wî ya yekem bike. Di berhemên yekem de, gellek caran hevok li hevdu nagirin û mirov dikeve wê baweriyê ku melodiya peyvan û hetta nefesa wan diguhere û ev guherîn jî bi awayekî sistematîk pêk nayên. Ev yekembûna berhema pênuşa nivîskêr me mecbûr dike ku em vê mijarê ji nivîseke din (an jî ji berhemeke wî ya din) re bihêlin. Ji ber ku romana yekem e, divê mirov di vê hêlê de li bende be ku pênuşa nivîskêr hebekî din jî bikemile û mirov ji bo vê yekê divê bi sebir be.

Di vê romanê de ya ku divê di bîra mirov de bimîne ew e ku mijara wê mijareke orjînal e û tevna wê biserketî ye. Lê herweha bala xwe daye psîkolojiya lehengan jî.

Dîsa ji ber vê hêla bikaranîna zimên ya yekem, ku mirov nikare bi yekembûna berhemê ve girê bide, nivîskar carinan di nava vegotinê de xwe dubare dike ku pêdiviya romanê pê tune bû. Bi vî awayê dubarekirina peyvan, ew carinan xwe nêzîkî romanên kurdî yên din dike ku tim jî ber vê hêla wan gazind ji zimanê wan tên kirin. Nivîskarên me yên ku nuh dinivîsîn, divê ji bandora nivîskarên berê derkevin. Berê, zimanê kurdî di pexşanê de têr nehatibû bikaranîn, ji ber wê xelkê hema çî bihataya ber devê wan dinivîsand. Carinan zimanê devkî guh nade wateya peyvan, lê nivîsê wê kêmaniyê efû nake. Mixabin, êdî awayekî vegotinê yê ecêb peyda bûye ku em di vê romanê de jî hin minakên wê dibînin.

Mînak :

Li erdê ji herriyê deryayek çêbûye. Deryayek ji herriyê... (r. 5) (Ji bo çî « herrî » dubare bûye, nayê fahmkirin)

Qorne û qlaksona trimbêlan (r.15) (Qorne û qlakson herdu jî heman tişt in)

Li derve mij ji bîska din girantir bûbû. Ew mija bîska din, hêdî hêdî bi gewrbûna xwe, xwe bera ser bajar dida. Mijeke qalind qumişbû ser bajêr... (r.27) (Sê hevok, lê hersê jî ji bo şayesandina mijê ne ku êdî bi mirov giran tê).

Bi van hêlên xwe ve, digel kêmaniyên xwe jî, romana *Jar lê Sermest* weke yek ji romanên herî balkêş di nava romanên kurdî de diyar dibe. Lê piştî ku mirov xwendina wê xelas dike, mirov xwe nagire û ji xwe re dibêje « xwezî hebekî din jî daweriviyaya... xwezî nivîskêr ew qasî ecele nekiraya ji bo çapkirina wê »... Lê, weke ku me got, romana yekem e. Ev nivîskar dê hê berhemine xurttir jî biafirîne.